## 4. KOMÎSYONA HERÊMÎ


Li Îtalyayê, saziya tekane ku ji bo lêkolîna serlêdana we ya penaberiyê berpirsiyar e, Komîsyona Herêmî ya Naskirina Parastina Navneteweyî ye.

Daxwaza we dê bi rêya **hevpeyvîneke** ku tê de mafê we heye ku hûn daxwaza hebûna wergêrekî ji eynî ziman û zayenda xwe bikin, were lêkolîn kirin.


Hevpeyvîna we dikare wekî vîdeoyê were tomar kirin. Eger hûn razî nebin, hûn dikarin sedemên xwe ji Komîsyona re ku dê li ser daxwaza we biryarê bide diyar bikin.
Di hemû qonaxan de, lê bi taybetî di vê demê de, derfeta we heye ku hûn belge, bîranînên kesane, sertîfîkayên tibbî, wêne, an delîlên din ên ku hûn ji bo daxwaza xwe ya parastinê kêrhatî dibînin nîşan bidin.

Dibe ku Komîsyona Herêmî **mafê penaberiyê, parastina pêvekî** an jî biryareke neyînî bide. Di rewşa dawîn de, Komîsyon dîsa jî dibe ku formeke parastinê ya bi navê **parastina taybetî** bide we, eger hûn vegerin welatê xwe, jiyana we di talûkeyê de de be.


Eger hûn bi biryarên ku komîsyonê dane ne razî bin, mafê we heye ku hûn îtîraz bikin. Her weha mafê we yê alîkariya hiqûqî ya bêpere heye.



REWŞA PENABER



PARASTINA PÊVEKÎ



BIRYARA NEYÎNÎ

PARASTINA TAYBETÎ

## 5. MAFÊN SÛDEWAR PARASTIN

Eger awayekî parastinê ji we re were dayîn, mafê we heye ku **destûra rûniştinê** ya ku li gorî cureyê naskirinê diguhere: pênc sal di rewşên parastina navneteweyî de, ango statuya penaberiyê û parastina pêvekî; du sal di rewşên parastina taybetî de.

Dema ku ew qediya, hûn dikarin ji bo **nûkirina** destûra rûniştina xwe serî lê bidin. Mafê we heye ku hûn **bixebitin, bixwînin** û **alîkariya tibbî** bistînin.

Eger Rewşa we ya penaberiyê yan jî rewşa we ya parastinê ya pêvekî hebe, hûn dikarin serî li belgeyekê bidin ku destûrê dide we ku hûn heta nod rojan **seyahat bikin** û li Ewrupayê bigerin.




- REWŞA PENABER
- PARASTINA PÊVEKÎ




- PARASTINA TAYBET


Ev belge li welatên ne Ewrepî jî derbasdar e ji bilî welatê we yê jêder. Di her rewşê de, berî ku hûn biçin, her gav balyozxaneya welatê ku hûn dixwazin biçin agahdar bikin.

Her weha mafê we heye ku hûn malbata xwe bi rêyeke qanûnî û ewledar bînin Îtalyayê, bi rêyekê ku jê re **Ji nû ve yekbûna malbatê** tê gotin.

Ji bîr nekin ku eger di derheqê her aliyekî pêvajoyê de gumaneke we hebe an hewcedarî bi agahdariya zêdetir hebe, hûn dikarin bi nûnerê qanûnî yê navenda ku hûn lê dimînin re têkilî daynin, **UNHCR,** Ajansa Penaberan a UN, an rêxistineke din pisporê penaxwaziya bijartina we.



Mafê we heye ku hûn bixebitin, bixwînin û alîkariya tibbî bistînin.



Progetto co-finanziato dall'Unione Europea

MINISTERO DELL'INTERNO

FONDO ASILO, MIGRAZIONE E INTEGRAZIONE (FAMI) 2014-2020

### TÊKILIYÊN BIKÊR

HELPLINE 800 905 570 — Xeta Alîkariyê ji bo penaber û penaxwazan ku ji hêla ARCI û UNHCR ve hate çêkirin

JUMA MAP Refugees map services www.jumamap.it — Nexşeya neteweyî ya xizmetên ji bo penaxwaz û xwediyên parastinê

UNHCR The UN Refugee Agency www.unhcr.it — UNHCR Îtalya

# MA HEWCEDARIYA WE BI PARASTINÊ HEYE?



## 1. DEMA KU KESÊN BIYANÎ DIKEVIN NAV ITALYAYÊ MAF Û PEYWIRÊN WAN ÇI NE?

Bi xêr hatî, tu hatî Îtalyayê. Ev tê wê maneyê ku hûn di nav Yekîtiya Ewrupî de ne.
Her kesê ku tê Îtalyayê divê serî li **rayedarên neteweyî** bide da ku were naskirin. Ji polîs netirsin, ji ber ku ew dikarin alîkarî û parastina we bikin. Ji bo ku hûn werin naskirin, divê hûn nav, paşnav, dîroka jidayikbûna xwe, navê welatê ku hûn lê ji dayik bûne û navê welatê ku hûn hemwelatiyê wê ne, bi awayekî rast û temam diyar bikin.

Ger di vê qonaxê de **belgeyên** we hebin, wan nîşan bidin. Girîng e ku hûn diyar bikin ka hûn bi endamên malbatê re rêwîtiyê dikin an na.



Her weha divê hûn sedemên ku hûn ji welatê xwe derketine û sedemên ku hûn hatine nav Îtalalyayê jî rave bikin.
Pêvajoya nasnameyê ji girtina **wêne û şopa tiliyên** we pêk tê. Ev Pêvajoyeke standard e ji bo hemû hatinên nû.

Girîng e ku hûn fêm bikin ka çi ji we re tê ragihandin û di belgeyên ku hûn îmze dikin de daxuyaniyên we rast werin ragihandin. Ji ber vê yekê, eger tiştek ji bo we ne diyar be an gumana we li ser hebe, hûn dikarin bi **alîkariya wergêrek** ronîkirinê bixwazin.



Eger hûn **ji 18 salî biçûktir** bin û hûn bi tena serê xwe rêwîtî dikin, tavilê vê yekê ji rayedaran re an eger hebe, ji rêxistinên mirovahî re ragihînin.
Zarokên ku bi tena serê xwe digihêjin Îtalyayê, mafê wan heye ku werin parastin û bigihîjin navendên pêşwaziyê yên ku ji bo wan hatine veqetandin. Her wiha mafê wan heye ku li Îtalyayê bimînin û ji aliyê weliyekî ve jî alîkariya wan were kirin.

Eger **pirsgirêkeke te ya tenduristî** yan jî hewcedariya te ya taybet hebe, tavilê ji rayedaran re an jî eger hebe, ji rêxistinên mirovahî re bişînin.




## 2. XWEGIHANDIN LI **PÊVAJOYÊ**

Eger hûn ditirsin vegerin welatê xwe ji ber ku jiyana we an jî ya malbata we di talûkeyê de ye, mafê we heye ku hûn parastinê bixwazin.


Eger hemwelatîbûna we tune be û ji ber ku jiyana malbata we di telûkeyê de ye ditirsin vegerin welatê xwe yê niha, mafê we heye ku hûn parastinê bixwazin.
Eger hûn ji ber nijad, netew, endamtiya koma etnîkî, ol, ramana xwe ya siyasî li rastî **tadeyê** hatine an jî **ditirsin ku tade li we were kirin** rastî şîdet û koletiyê tên, eger hûn bitirsin ku hûn li rastî cezayê darvekirinê, îşkencekirinê werin an jî hûn ji herêma şer werin, hûn dikarin parastinê bixwazin.
Piştî ku we tirsa xwe ya vegera li welatê xwe diyar kir, hûn ji hêla rayedaran ve wekî **penaxwaz** tên qebûlkirin.
Ji bo qeydkirina daxwaza xwe ya penaberiyê, divê hûn bi **Polîsên Îtalî** re têkilî daynin. Daxwaza we dê paşê ji Komîsyoneke taybetî re were şandin ku peywira nirxandina we ya serlêdanê heye.





Daîreya Koçê ya Polîsan, bi hev re **wergêrê zimanê we,** wê ji we re bibe alîkar ku hûn formeke bi navê **C3** tijî bikin, ku tê de hin agahdariya kesane ya berfirehtir wek koma etnîkî, ziman û ola we.
Di vê qonaxê de, rayedar dê ji we van pirsan bikin: ka gera we ya Ewrupayê çawa derbas bû, gelo hûn li welatê xwe li rastî îşkence, trawma, şîdet û binçavkirinê hatine an na, di gera we de hûn ji komên siyasî ne an na, endamên malbata we li Îtalyayê an Ewrupayê heye an na û belgeyên we bi we re ye an na.

Eger **pirsgirêkên >e yên tenduristiyê** an **hewcedariyên we yên taybetî** hebin, hûn dikarin niha û her dem di dema **pêvajoyê** de li ser wan biaxivin. **Di rastiyê de, eger hûn li rastî nexweşiyên giran** an tengahiyên derûnî hatibin, an jî li rastî îşkence, destavêtin, an şêwazên din ên giran ên şîdeta derûnî, laşî, an zayendî hatibin, mafê we heye ku hûn arîkarî û xizmeta pispor bistînin.
Di vê qonaxê de, **sedemên** ku çima hûn daxwaza parastinê dikin bi zelalî rave bikin. Eger hûn bixwazi, hûn dikarin van sedeman bi nivîskî bişînin.
Di vê qonaxê de, eger hewce be, hûn dikarin bixwazin ku hûn li **navendeke pêşwaziyê** bibin mêvan.
Girîng e ku hûn fêm bikin ka ji we re çi tê gotin û gotinên we rast li ser formê hatin ragihandin an na. Eger mijarek ne zelal be, ji wergêr bipirsih ku tiştên ku hatine gotin bila zelal bike.
Di dawiya hevpeyvînê de, ew ê ji we bixwazin ku hûn vê formê îmze bikin û ew ê kopiyekek wê bidin we. Wê li cihekî ewle bihêlin.
Tevahiya agahdariya ku hûn pêşkêş dikin dê bi awayekî **nehîniya** ya asta bilind were parastin û dê bi rayedarên welatê we re, an jî bi welatên sêyemîn re neyê parve kirin.
Di hin rewşan de, serlêdana we ya ji bo parastinê dikare bi taybetî ya **pêvajoyeke lezkirî** ya ku di nav şertên kurt de tên kirin were nirxandin. Digel pirsgirêkên tenduristî an hewcedariyên taybetî, mafê we heye ku hûn muayeneya pêşîn a serlêdana xwe bikin.
Bînin bîra xwe, eger hewcedariya we bi agahdariya zêdetir hebe, hûn dikarin bi şêwirmendê qanûnî yê navendê an Daîreya Koçê re têkilî daynin.






Eger hûn li rastî nexweşiyên giran an tengasiyên derûnî hatibin an jî li rastî îşkence, destavêtin, an şidetên din ên giran ên derûnî, laşî, an cinsî hatibin, mafê we heye ku hûn alîkariya guncan û xizmetên pispor bistînin.



### Parastin

Wek penaxwazekî, mafê we heye, eger hewce bike, hûn li navendeke taybet werin pêşwazîkirin, **destûra rûniştinê ya demkî** hebe û hûn li ser axa Îtalyayê li benda lêkolîna serlêdana xwe bimînin. Ji bîr nekin heta ku hûn penaxwaz bin hûn nikarin ji axa Îtalyayê derkevin.
Du meh piştî wergirtina C3 hûn dibin xwedîyê **mafê xebatê**ya bi rêkûpêk li Îtalyayê.
Ji bîr nekin di dirêjahiya pêvajoyê de, mafê we heye ku hûn bi UNHCR, Ajansa Penaberan a Neteweyên Yekbûyî, an bi rêxistineke din a pisporê penaberiyê re têkilî daynin.



Ji bîr nekin heta ku hûn penaxwaz bin hûn nikarin ji axa Îtalyayê derkevin.

## 3. PEYMANA **DUBLÎNÊ**

Piştî ku hûn hatin vî welatî, Îtalya ji parastina we berpirsiyar e û ji ber vê ji bo parastina we divê serlêdana we qeyd bike.
Bi giştî, welatê ku ji bo nirxandina serlêdana we ya penaberiyê berpirsiyar e, ew welat e ku hûn cara yekem ketinenav Ewrupayê ye. Lêbelê, eger endamên malbata we hene ku li **welatên Ewrupî** yên din dijîn, an eger belgeyên we yên ku ji hêla welatên din ên Ewrupî ve hatine derxistin hebin, dibe ku serlêdana we ji hêla welatekî din ve were nirxandin ku hûn bi qanûnî û bi ewlehî werin veguhastin.
Ji ber vê sedemê, eger li welatekî din ê Ewrupayê **endameke malbata** we hebe, girîng e ku hûn di dema herî zû de rayedaran agahdar bikin.

Ji vê pêvajoyê re **"Pêvajoya Dublîn"** tê gotin û armanca wê tenê ew e ku welatê ku pêvajoya penaberiya we lê pêk were, lê ew sedemên ku we serlêdana parastinê kiriye bi xwe ve nagire. Pêvajoya Dublînê ji bo hemû dewletên endamên Yekîtiya Ewrupayê û her weha Norwêc, Îzlanda, Swîsre û Liechtenstein derbas dibe.

